

Xebateke Berawirdkarî (Komparatîf) û Dijberawirdkarî (Kontrastîf) li ser Demên Îngilîzî û Kurmancî

The Comparative and Contrastive Studies of English and Kurdish (Kurmanji) Verb Tenses

Nesim SÖNMEZ*

Resul GEYİK**

PUXTE:

Her çiqas Îngilîzî û Kurmancî di heman malbata zimên de cî bigirîn jî di şaxên cuda de ne, hevparî û cudahî di navbera her du zimanan de hene. Gava xwendevanek ji van zimanan yekî hîn dibe hevparî teqez hînbûnê hêsantir û cudahî jî diwartir dike, ev jî ji ber hebûna hevparî û cudahiyan, bi awayekî normal dibe sedema tevliheviya mijaran. Armanca me di vê gotarê de bi berawirdkirina demên Îngilîzî û Kurmancî, tespîtkirina hevparî û cudahiyan e. Bi nêrîna zimanzaniyê, ev mijar di her du zimanan de bi awayên cuda dikare bîr xandin.

Di destpêka gotarê de, pênasekirina têgehên berawirdkirinê heye. Û pey re jî

dîroka xebatên berawirdkirî yên Îngilîzî û Kurdî-Kurmancî tîrî vegotin. Berawirdkirin wê di asta hevoksazî (sentaks) û di bikaranîna deman (semantics) de be. Di serî de, hevokên hevpar dê bîr hilbijartin û berawirdkirin. Armanca bidestxistin û dîtina hevparî û cudahiyan e. Mirov dikare bibêje wekî metodê wê şayesandin, berawirdkirin, şîrovekirin û texmînkirin bîr bikaranîn. Digel zaravayê Kurmancî hatibe xebitîn jî, mînakên Soranî, devokên Kurmancî yên bi cudahiye ku me bidestxistine jî hatine dayîn. Digel formulên demsaziyê di her du zimanan de, bikaranîna deman jî hatine dayîn da ku mirov bikare bi awayekî vekirî formên bibîne û bide berhev. Di dawiyê de mînakên bikaranînê

* **Dr. Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstituya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Wan, Turkiye**
Assistant Professor, Yüzüncü Yıl University,
Living Languages Institute, Kurdish
Language and Culture Department, Van,
Turkey
e-mail: nesimsonmez@hotmail.com

** **Pispor, Zanîngeha Mardin Artuklu, Enstituya Zimanên Zindî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, Turkiye**
Specialist, Mardin Artuklu University, Living
Languages Institute, Kurdish Language and
Culture Department, Mardin, Turkey.
e-mail: resulteacher@gmail.com

hatine dayîn û cudahiyên her du zimanan hatine derbkirin û bi mînakên jî rewşa wan bi awayekî zelal hatiye dayîn.

Weke pirsgirêkek mirov dikare bibêje ku tunebûna xebatên bi vî rengî û şeklî teqez pirsgirêkên metodê derxist holê, lê ji aliyekî din ve jî ev bû sedema nerîneke resen û pêşane. Di encama gotarê de jî encamên li gorî bikaranîn, hevoksazî, demsazî û rê û rebazên her du zimanan hatin derxistin.

Bêjeyên sereke: Îngilîzî, Kurdî, dem, berawirdkirin, zimanê armanc, Kurmancî.

ABSTRACT:

Our objective in this paper is to compare and contrast the English and Kurdish-Kurmanjî verb tenses. Though both languages are in the same language family, the similarities and the differences between them do exist. When a learner initiates learning one of the languages mentioned above, with no doubt, the similarities facilitates the learning, whereas the differences complicate the learning period and the process.

The paper starts with the definition of the concepts related to the comparative and contrastive studies. It then goes on to discuss the history of the comparative and contrastive studies in English and Kurdish studies. The comparison will be implemented in terms of syntax and the usage of the tenses. First, the common samples will be chosen and be compared. It can be said that as a method definition, comparison, evaluation and guess stages will be used. Even though Kurmanci dialect has been used, examples obtained from Sorani and other Kurmanji dialects have also been dealt with. The formulas for forming the verb tenses, the usage of the tenses have also been drawn so that the readers can see the usage of the tense in a clear way. Then the samples for each usage have been presented to emphasize and show it clearly.

Having no former studies of this nature has brought about some problems in terms of methodology, however it gave rise to an original and a free approach to carry out.

In the result part of the article, the results obtained through the usage of the tenses, syntax, sentence syntax and the approach to both languages are of utmost significance.

Keywords: English, Kurdish, comparison, tense usage, target language.

1. DESTPÊK

Gelek nîqaş di zimanên cuda de li ser peyvên “comparative” û “contrastive”ê hene. Di kar û xebatên li ser van peyvên ve wateyên cuda tên nirxandin. Bi peyva “comparative” ê wateya hevpariyê û bi peyva “contrastive”ê wateya cudahiyê tê qestkirin. Peyva “comparative” di Almanî de “Komparativ” û “contrastive” jî wekî “Kontrastiv” tê bikaranîn. Hêj jî ev rewş di hin zimanan de ne wekî hev in, yan jî li gorî dem û nirxandinan tê guherandin. Bo nimûne, di zimanê Tirkî de bi gelemperî

peyva “karşılaştırmalı” hatiye bikaranîn, herwiha peyva “karşıtsal” an “karşıtsal dilbilim” di van salên dawî de hatine afirandin û bikaranîn. Di zimanê Kurdî - Kurmançî de bi gelemperî peyva “berawirdkirin”ê, ku ev peyv jî ji zaraveya Soranî hatiye girtin û roj bi roj di nav civakê de cihê xwe jî girtiye. Lê peyvên wekî “dan ber hev” û “rûberî hev kirin”ê ji bona hevpariyê û “hevberane” yan jî “hevberkî” jî ji bona cudahiye mirov dikare bibîne û bibîhîse. Lê di van peyvan de mirov wekî wateya peyva “comparative”ê hevparî difikire. Wek peşniyaza Tahirhan Aydın mirov dikare bi pêşgira “dij”ê peyvek nû ava bike, bo nimûne “*dij-berhevdanê*” yan jî “*dij-berhev(k)î*” yê bi kar bîne. Samî Tan di gotareke Zendê de peyva “hevrûkirinê” jî bi kar tîne (Tan, 2013: 96). Wekî ku diyar e, ji bo peyva “hevrûkirinê” mirov dikare bibêje ev ji bona nişankirina hevpariyê ye. Lê em ê di vê xebata xwe de peyva “berawirdkirinê” ji ber ku di nav xebatan de bi awayeke gelemperî cihê xwe girtiye û ji bona cudahiyan jî peyva “diberheviyê” bi kar binin.

Ji bona pirsê “*çima ziman dişibin hev?*” bersiva Alexandra Y. Aikhenvald wiha ye, ziman di kategorî, hevok û di warê wateyan de dikarin bişibin hev. Kategorî dibe ku bişibin hev ji ber ku ew gerdûnî ne – bo nimûne her ziman bi awayekî xwediyê qalibên pirsan an jî qalibên fermanî ne (Aikhenvald, 2006: 1). Ji ber şibandina wergerê ya mirovan, di hînbûna zimên de yan jî di hizirkirina zimên de jî mirov nikarin xwe ji bandora nêrîna zîmanan xelas bikin. Bi rastî ev rewş jî zehf normal e, ji ber ku însan herdem di nav lêgerîna rêya hêsankirina tiştan de ne.

Dema mirov zimanekî hîn dibe, bê hemdê xwe û bi nezanîbûn zimanê ku hîn dibe dide ber zimanê ku dizane. Bi awayekî mirov dixwaze zimanê armanc (zimanê ku hîn dibe) hêsantir bike yan jî hewl dide ku têkeve nav lêgerînekê ku bikaribe pêwendiyêke di navbera tiştên nû û yên berê derbixe holê. Lewra xebatên berawirdkirinê û dijberhevkirinê bi awayekê bê hişmendî pir têne bikaranîn. Gelo xebatên berawirdkirinê çi ne? Xebatên Berawirdkirinê û Dijberhevkirinê (XBD) bi awayekî sistematîk berhevdana du yan jî zêdetir zîmanan e, ev jî bi armanca şayesandina hevparî û cudahiya wan e (Johansson, 2008: 9). Herwiha armanca xebatê bi taybetî bidestxistina cudahiyan e (Aitchison, 1992: 142).

Lewra di berhevdana zîmanan de wê teqez di encaman de mirov li ser tiştên hevpar û cuda bisekine. Gelek mirovan ev rêbaz jî bona hînbûn û hînkirinê bi kar anîne. Sedema ku Robert Lado dest bi xebatên berhevdanê kiriye ev bûye ku, ew hewcedarê amadekirina materyalên hînkirina zimên bûye. Lado dibêje ku: “*Li gorî me, ku xwendekarek bi ziman re têkeve nav tîkiliyê, wê hin tiştan hêsan û rehet, hin tiştan jî zehmet bibîne. Tiştên ku dişibihî zimanê wî/ê yê zikmakî wê hêsan û rehet bin, yên ku neşibihî jî wê zehmet bin. Lewra mamosteya/ê ku berhevdana zîmanê zikmakî dike wê pirsgirêkên wan bizanibe û derseke çêtir bide.*” (Lado, 1957: 2). Xebatên berhevdanê ji aliyê Lado ve di salên 1950îyan de di pirtûka bi navê “Linguistics across Cultures (Di Nav Çandan de Zimannasî)” dest pê dike. Armanca

wî ew e ku bi saya berhevdan û dijberhvekirinê hînbûna zimên hêsantir bike. Bi gelemperî hem hevparî hem jî cudahî tên analîzkirin û kirpandin (emphasis) bi piranî li ser cudahiyan e ku ew wekî sedema têkilîkirina neyînî (transfera neyînî, çewt bikaranîna qalibên ji zimanê zikmakî di zimanê duduyan de) tên dîtin (Bussman, 2006: 250). Mamosteyê wî ku di zanîngeha Michiganê de dixebite vê rewşê wiha bilêv dîke: “*Materyalên herî kêrhatî ew in ku li ser zimanê armanc bi awayekî zanistî ne û bi awayekî baldarî bi şayesandîneke hevaheng û bi zimanê zikmakî divê bê berhevdarî.*” (Fries, 1957:1). Herwiha berawirdkirin û dijberhvekirin (XBD) jî bi gelemperî di xebatên gramer, ferheng û fonetîkê de çê dibe.

Ji ber ku hemû mirov bi şexlekî û bi rengêkî cuda difikirin, hîs dikin û hizir dikin, rewşa bandora navborî bi awayeke cuda rû dide. Herwiha tecrûbe, serborî û paşxanên mirovan jî ne wekhev in, lewra berawirdkirina mirovan jî ne wekhev in. Herkes tiştan li gorî xwe, li gorî nerînên xwe diveçirîne, şîrove û analîz dîke. Tesnîfkirina zimanan girêdayî krîterên ku em ê hîlbijêrin tên guhartin – fonolojîk, sîntektîk, morfolojîk û hwd. (Corder, 1983: 227). Berawirdkirina deng, peyv û sîstemên rêzimanî ya zimanê zikmakî û zimanê armanc bi awayekî sîstematîk – bi niyeta dîtin û nîşandana cudahiyan girîng (Task, 2007: 21) jî di heman nerînê de ye, ji ber ku divê bi rêyekê bê kategorîzekirin.

Sedema derketina XBDê li gorî îddîaya gelek kesan ew e ku ziman giş ji heman kokê (rayê) derketine û ev jî bûye sedema kar û xebatên wan (Yule, 1996: 213). Dibe ku mirov her tim di nav tevgera rêgerîn û rêdîtinek hêsankirina hînbûna peyvên zimanê armanc de be.

Gelek xebatên berawirdî li deverên cuda hatine kirin. Li Hîndîstanê ji aliyê Panîni ve bi navê “*Astadhayayi*” (*Heşt Pirtûk*), bi zimanê Sanskrîtî, di salên 600 – 300 BZ hatiye nivîsîn û ev pirtûk di nav xebatên zimanê Hind-Ewropî de yekem xebata zanistî ye (Lepschy, 1996:61). Ev xebat li ser rêzimanê ye û tenê bi avakirina rêzimana Hind-Ewropî nemaye di heman demê de li Ewropa piştî 2300 salan jî zimannasiya modern ava kiriye û ji bona destpêkirina zimannasiya berawirdkirî û dîrokî jî piştgirî daye (Fischer, 1999: 142). Bi gelemperî tê zanîn ku li Yewnenîstanê bandora Plato û Arîsto li ser zimannasiyê, li Romayê bandora dêrê, li welatên ereban bandora Qur’ana pîroz, li Çînê bandora nivîsa Çînê gelek derfetên nû dane û zimannasî jî bi awayekî berawirdkirî pêşve çûye.

Zimannas herdem bi berawirdkirina zimanan re eleqedar bûn û xebatên pêşeng û ewil di sedsala nozdehande derketine holê (Carl, 1981: 3). Rêzimana zimanekî ji ber xwe nayê avakirin. Ji bo amadekirina rêzimanan xebatên ku li ser zimanên din hatine kirin bivê nevê wekî model tên pejirandin. Kurmancî jî di vî warî de ne bi tenê ye (Aydoğan, 2013: 49). Celadet E. Bedirxan dema ku pirtûka xwe nivîsand, ew jî di hin tiştan de ket bin bandora zimanên din bi taybetî ji Fransî. Di zimanê Îngilîzî û Almanî de herfa serî ya navê neteweyan bi herfên mezin (girdek) tên nivîsin, lê

di Fransî de navê neteweyan bi herfên biçûk (hûrdek) tên nivîsin. Her kes li ser vê rewşê hemfikir e ku ev taybetmendî ji zimanê Fransî hatiye girtin. Ji ber ku Kurmancî di bin bandora sê zimanên berbelav de maye û wek zimanê perwerdehiyê derfetek nedîtiye, gelek normal e ku kesên ku li ser zimên dixebitin di bin bandora zimanên ku dizanin mîna Tirkî, Erebi, Farsî yan jî zimanên wekî din de bimînin.

Xebatên li ser berawirdkirin û dijberhevkerina demên zimanên Îngilîzî û Kurmancî bi awayekî akademîk li gorî lêgerînên înternetê û xebatên ku tên zanîn rasterast tune ye, xebatên di pirtûkên rêzimanê de teqez hene, wekî Tackston, Soane, Joyce Blau, Baran Rizgar û hwd. Lê xebatên berawirdkirin û dijberhevirinê, li ser hêmanên din hene. Di pêvekên pirtûkan da cihê referansan de jî hin çavkanî wekî gotar an jî tezên nehatine weşandin hene lê ji ber ku em nikarin bigihijine wan, em ê cih nedin wan xebatên navborî. Li welatên din berawirdkirin û dijberhevkerina zimanan, bi texmîni di salên 1950yan de bi taybetî ji Robert Lado şûn de bi awayekî zimanzaniya modernî, dest pê kirine û hê jî didomin, lê xebatên ji bona zimanê Sanskîrîtî, Almanî, Zimanên Sikandînav di sedsalên 17 an jî 18an dest pê dikin û ew jî . Ev xebat li gorî demê pir derengmayî ye. Lê ji ber ku ev jî ji bona zimannasîyê tiştêkî jêneger e, xebatên wisa û yên hurgilîtir pêwîst in.

Xebata Runak Nashaat Assi (2015) bi navê “*A comparative / contrastive study of subject-Verb concord in standard English and Kurdish*” li ser hevparî û cudahiya lihevhatina (ahenga) bikêr (kirde) û lêkerê (subject - verb) di her du zimanan de ye. Assi di xebata xwe de li ser hêmanên rêzimanê, têgehên û ahengê disekine. Gotar ji çar beşan pêk tê: Beşa ewil destpêk (danasîn) e, ya duduyan ahenga zimanê Îngilîzî, ya sisêyan ahenga zimanê Kurdî ye û ya dawî jî berawirdkirin û dijberhevkerina her du zimanan û encamên ku bidest ketîne ne. Encam bi rengekê senifandî ye. Herwiha di dawîya gotarê de pêvekek li ser sembolên fonemîk di derheqê zimanê Kurmancî de heye.

Xebata Hadis Parsa (2015) bi navê “*the contrastive analysis of English and Kurdish intonation patterns and its effect on Kurdish-speaking students*” li ser şeklê întonasyona Îngilîzî û Kurdî (Sorani) û çawa bandorê li ser xwendekarên Kurdiaxêv dike dinirxîne. Parsa ji bona xebata xwe gelek deng qeyd kirine û şeklên wan bi frekansan dane. Ev frekans wekî metod hatiye şîrovekirin. Di encamê de jî hevpariya Îngilîzî û Kurmancî şîrove kiriye.

Xebateke tezê ku berfireh e ya Saza Ahmed Fakhry Boskanyî (2001) ye. Navê vê xebata tezê “*A Contrastive Analysis of Agreement in Standard English and Standard Kurdish*” e. Xebatê gelek sernavên girîng û sereke di her du zimanan de berhev kiriye. Boskany di xebata xwe de, di hemû binbeşan de, hevokan li gorî sentaksê dide berhev. Pîrbûna mînak û referansan jî balê dikêşîne.

2. METODA BERAWIRDKIRIN Û DIJBERHEVKIRINA DEMÊN ÎNGILÎZÎ Û KURMANCÎ

Ji ber ku Kurmancî û Îngilîzî di heman malbata zimên de ne, mirov nikarê bibêje her tişt teqez dişibin hev an jî bi tevayî ji hev cuda ne. Hevparî û cudahî dibe ku di her ast û cihî de hebe, bo nimûne di asta rêzîmanê, ferhengê yan jî di fonetîkê de be. Em ê di vê xebatê de hevokên demên Îngilîzî û Kurmancî bidin berhev. Rêbaza ku em ê bi kar bînin wê berawirdkirin û dijberhevkarina hevokan be. Ew jî dê tenê ne ji çavkaniyekê lê, ji pirtûkên cuda, carinan ji xebatên berê ku li ser zimên hatine kirin, carinan jî mînakên ku me di pêvajoya perwerdehiya zimên de bi dest xistine û kêman jî ji lêgerînên internetê be. Bi gelemperî di van xebatan de çar gavên bingehîn wekî *şayesandin*, *birêxistin*, *berawirdkirin-dijberhevkarin* (*dijberawirdkirin*) û *texmîn kirin* tên bikaranîn. Vahid Aryadoust van gavan di gotara xwe de wiha şîrove dike (Aryadoust, 2015: 5):

Şayesandin: Ev gav bi gelemperî pêşiya ku mirov tiştên ku dê bînin berawirdkirin, bînin pêşkeşkirin û şayesandinê de bi kar tîne da ku mirov bi kari be wan hêmanan ji hev cihê bike û cudahiya wan bizanibe,

Birêxistin: Di vê astê de mirov biryara tiştên ku dê bînin berawirdkirin dide. Bi awayekî rêzkirin e.

Berawirdkirin û dijberhevkarin: Cihê berawirdkirin û dijberhevkarina hevparî û cudahiyên rast ev der e. Bi gava duduyan re tekilî tê dayîn.

Texmînkirin: Piştî berawirdkirinê wê texmînkirina hîn hêmanên sentaksî, morfolojîk û semantîkî hêsantir be.

Me jî rêbazek wek bişibihe vê rêbazê bi kar anî. Me nêzikatiyên *mînakdayîn*, *şîrove*, *berawirdkirin-dijberhevkarin* û *texmînkirinê* bi kar anîn. Şîrovekirin û berawirdkirin-dijberhevkarin bi gelemperî bi hev re wê bînin kirin. Asta texmînkirinê astekî zehf zehmet e, çima ku mirov nikare di heman demê de hemû guherînan zimên bi awayekî rast û demdirêj kontrol bike yan jî jê haydar be. Carinan jî mirov bê hemd peyvên zimanên din bi kar tîne.

Mînak:

i. Ji ber bayê diretrite (Herêma Mêrdînê)

Peyva “diretrite” di eslê xwe de peyveke herêmî (Li Elihê û hin deverên Mêrdîne) ye, lê ji ber ku gelê Kurmancîaxêv gelek caran wê peyvê dibîhîsin, gelek kes bê zanebûn wê peyvê bi kar tînin.

ii. Roja cimhê, em ê herin Wanê (Navçeya Tetwanê)

Peyva “cimhê” jî di eslê xwe de peyveke Erebi ye. Lê deyingirtina peyvan (borrowing) ji zimanekî bo zimanekî din gelek caran pêk tê û di nav hemû zimanan

de ji ev tişt pêk tê. Bi gelemperî peyvên teknolojîk û teknîk pir tîn afirandin û deyngirtin.

iii. Ev tişt xêşa min diçe (Navçeya Farqînê)

Ev biwêja “xweşa min/kesekî çû” ji mentîqa Tirkî hatiye stendin. Wergera wî jî di kurmanciya resen, zelal an jî pêtî de peyvya “kefa te hat” an jî “kefa kesekî lê hat” tê bikaranîn.

Ji bona bidestxistina hevparî yan jî cudahiye Yarmohammadi wiha dibêje: “*Pisporên xebatên berawirdkirin/dijberhevdanê hevpariyê di bin pênc xalan de bihev dane, ev jî wiha ne:*

- 1) *Wate,*
- 2) *Form (avasazî; structure),*
- 3) *Fonksiyon (function)*
- 4) *Rêzikên pêvajoyê (rule or process) û*
- 5) *Taybetmendiye pexşanî û vegotinê (textual or discursal features).* (Yarmohammadi, 2002; 3).

Mirov dikare li ser van xalên ku hatine nîşandan xebata xwe ya berawirdkirin/ dijberhevkingirin li gorî daxwaz an jî hewcebûnê bibîne. Analîza berawirdkirina sentaktîk di nav xwe de her sê rêzikên jêrin dihevîne:

- a) Hevoksazî di her zimanî de çawa ye?
- b) Bi rêzên cuda çi guhartina peyvyan derdikeve?
- c) Çi peyvên cudahiye tîn ba hev û nayên ba hev? (Nasr, 1983; 129).

Di vê xebatê de, demên xwerû hatin hilbijartin. Wê dem di her dû zimanan de li gorî dû zimanan bîn *şayesandin*, *birêzxistin* û bîn *berawirdkirin* û *dijberhevkingirin*. Li ciyên pêwîst jî dê, *texmînkirin* bi kar bê. Di vê xebatê de formên bilanî, xwestekî, fermanî, mercî nehatine şîrovekingirin.

Pergala lêkerên Îngilîzî, bi formên borî û niha ye (Corder, 1983; 234). Pergala Kurmancî jî bi heman şeklî ye. Di Kurmancî de, rader qertafa –(i)n e (Bilbil û Baran, 2008: 65). Yanî qertafa raderê bi (in)ê tê nivîsin. Qertafa raderê tê dawîya lêkerê. Lêker bi vê qertafê nav digire. Gava lêker tê kişandin qertafên deman û kesan digirin (Taş, 2011: 7). Raderên Kurdî jî aliyê zayendê ve mê ne (Tan, 2010: 52).

Lêkerên Îngilîzî bi radera “to”yê yên Kurmancî jî bi “in”ê tîn avakirin. Lêkerên Kurmancî dikarin xwerû yan pêkhatî bin (Bedirxan û Lescot, 2012: 119). Celadet bi awayê jêr mînakandide:

Lêkerên Kurdî dikarin bibin xwerû yan jî pêkhatî.

Lêkerên xwerû:

Hat-in

Xist-in

Xwar-in

Lêkerên pêkhatî (dariştî)

Dahatin (da-hatin)

Vexwarin (ve-xwarin)

Bedîrxan dibêje ku “*Ji bilî lêkerên xwerû û pêkhatî, lêkerên biwêjî jî ji aliyê Kurdan tîn bi kar anîn*”.

Minak:

Li hev hatin

Tê derêxistin

Bi lêv kirin

Kadri Yıldırım lêkeran ji aliyê binyadê ve di bin sê beşan de pênase dike: xwerû, darijtî û hevedudanî (Yıldırım, 2012: 81).

- a) **Xwerû**: ajotin, alastin, axifin
- b) **Darijtî**: çêkirin, daketin
- c) **Hevedudanî**: deng-dan, şolî-bûn, sar-bûn

3. LÊKERA BÛNÊ

Lêkera bûnê di Kurmancî de behsa rewş û halê niha dike û ev hêj jî didome. Behrooz Shojai lêkera bûnê di bin navê kopulayê de wiha pênase dike:

“*Risteyên bi kopula di hêla semantîkî de rewşên domdar yan katî temsîl dikin. Subjekta verbên kopular yan rola semantîk a pasyentê dibînin yan wergirê rewşekê ne. Herwiha, dupayê barê ferhengî-wateyî ya predîkasyonê ne bi verba kopular bixwe, lê bi predîkato verbal - ku yan rengdêr (yan fraza rengdêrî) yan jî navdêr (yan fraza navdêrî) e – dihête hilgirtin.*” (Behrooz Shojai 2014: 1) Wekî:

Predîkata navdêrî (faza navdêrî): *Ew mamosteyek e tenbel e.*

Predîkata rengdêrî (faza rengdêrî): *Ew pir jîr e.*

Bikaranîna lêkera bûnê di Kurmancî û di Îngilîzî de wiha ye:

	Îngilîzî	Kurmancî
Navdêr	Ez <i>mamoste</i> me.	I am a <i>teacher</i> .
Rêngdêr	Ez <i>ciwan</i> im.	I am <i>young</i> .
Daçek	Ez li <i>male</i> me.	I am at <i>home</i> .

Dema em “*lêkera bûnê*”ê û “*to be*”ya Îngilîzî didin berhev, qertafên kesane (-im / me, î / yî...hwd) di Kurmancî de herdem li dawîya hevokê û qertafên Îngilîzî (am, is, are) jî piştî bikêrê tîn bikaranîn. Mînakên lêkera bûnê di Kurmancî de, wekî tê dîtin, li gorî herfa dengdêr an jî nedengdêra dawî ya navdêr an jî rengdêrê diyar dibe.

Hevoksaziya Kurmancî û ya Soranî jî wekhev in, di hevokê wiha ye:
 Bikêr + navdêr + **lêkera bûnê**

Rêngdêr

Di Soranî de hin tişt di pêvajoya cîgirtina zimên de, hin tişt li gorî Kurmancî guherîne, lê hin avasaziye bingehîn wekî bikaranîna lêkera bûnê wekî hev in û nehatine guhartin.

Mînak (Soane, 1919: 26):

{ Dinyā sār a	{ Baghā düer a
{ The weather cold is	{ Baghdad far is
{ Tu goj î	{ Hāwîn î Sulaimānî fenûk a
{ Thou a fool art	{ The summer of Sulaimania cool is
{ Min Kurd im	{ Romî îsta pashîmān en
{ I Kurd am	{ The Turks now regretful are

Mînak (Yıldırım, Sorani Öğretmeni, 2014: 17, 37, 167)

Mirovî zana behêz î.

Kame ciwan e?

Xwoş hal im.

Wekî di minakên jorîn de diyar e, lêkera bûnê, wekî *Kurmancî*, an tê dawiya hevokê yan jî tê pey rengdêr an jî navdêre. Di mînakan de “-î”, “-e” û “-im” hatiye pey rengdêr û navdêran.

Ev hevoksazî (sentaks) di Îngilîzî de ne wek *Kurmancî* ne jî wek *Soranî* ye.

	Îngilîz	Kurmancî
Bikêr + lêkera bûnê + Navdêr	(She is here)	(Ez ciwan im)
Rêngdêr	(She is angry)	(Ez li male me)
Daçek	(We are from Mardin)	(Ez xwendekar im)

4. DEM

4.1. Simple Present Tense û Dema Fireh

Present Tense	Dema Niha
I read the book	Ez pirtûkê dixwînim
You read the book	Tu pirtûkê dixwînî
S/he reads the book	Ew pirtûkê dixwîne
We read the book	Em pirtûkê dixwînin
You read the book	Hûn pirtûkê dixwînin
They read the book	Ew pirtûkê dixwînin

Di Îngilîzî de

Bikêr + lêker + pêvek

I / you / we / they

He / she / it

Kesê sêyemîn di zimanê Îngilîzî de bi herfa “-s”yê ditewe. Ev cudahiya lêzedekirina “s”yê tenê di hevokên erênî de pêk tê. Di formên neyinî (nerênî) û pirsan de ev rewş tune ye. Hevokên neyinî (nerênî) û pirsan de lêker wekî hev in yanî herfa “s”yê lê zêde nabe.

Di Kurmancî de

Bikêr + bireser + lêkera bûnê

Bikêr (cînavk)	Qertafa D.Niha	Rayek	Qertafa kesane
Ez			im (dikevim)
Tu		kev	î (dikevî)
Ew	di		e (dikeve)
Em / Hûn / Ew		<i>Li gorî lêkerê diguhere</i>	in (dikevin)

Ev rewş di Kurmancî de bi tevahî ji Îngilîzî cudatir e, ji ber ku qertafên kesane “-im”, “-î”, “-e”, “in”ê digirin. Bikêrên “em”, “hûn” û “ew” jî bi heman qertafê ditewin. Yanî ji bo hemû bikêran **lêker** diguhere. Gava mirov wan dide berhev, bi awayekî zelal xuyaye ku rewşa lêkeran di her dû zimanan de ne wekî hev in.

Bikaranîna dema fireh hem di Îngilîzî hem jî di Kurmancî de ji aliyê wateyê wextê borî, niha û bêyê di nav xwe de dihewîne. Ev bikaranîn:

- Bûyerên ku dubare dibin
 - Rastiyên dinyayê û tiştên gelemperî
 - Elimandinên însanan
 - Bernameyên ku di demekî nêz de wê pêk bînin (bi bikaranîna hokerên demê)
 - Di gotinên pêşiyên de
 - Di neqlkirin û behskirina film, şano û pirtûkan de
 - Serekeyên rojnameyan de
- tê bikaranîn.

Mînak

- a) Şevîn her sibe şîr **vedixwe**.
- b) Av di 100 dereceyî de **dikele**.
Dinya 24 seet bênavber li dora xwe **digere**.
- c) Ew kesek pir sekan e, rûyê (mehdê) xwe bi kesekî re tirş nake.
Jiyan her şev sê seetan pirtûkan **dixwîne**, û dereng **radikeve**.
- d) Ew derin betlaneyê – Ew hersal derin betlaneyê – Ew ê vê havîna peşiya me herin betlaneyê.
- e) Mêr bi navê xwe, teyr bi refê xwe, birûsk bi zeriya xwe, şêr bi lepê xwe, zilam bi cîraniya xwe li dinyayê **dimînin**.
- f) Di çîroka Mem û Zînê de, Beko her tim **hewl dide** ku navbera wan xera bike û wan ji hev veqetîne.
- g) Li ser jiyana koçberan bazarî tê kirin.

4. 2. Present Continuous Tense û Dema Niha

<i>Present Continous Tense</i>	<i>Dema Niha</i>
I am reading the book	Ez pirtûkê dixwînim
You are reading the book	Tu pirtûkê dixwîni
S/he is reading the book	Ew pirtûkê dixwîne
We are reading the book	Em pirtûkê dixwînin
You are reading the book	Hûn pirtûkê dixwînin
They are reading the book	Ew pirtûkê dixwînin

Digel ku Kurdî û Îngilîzî di heman malbata Hînd-Ewropî de ne, di nav şaxên cuda de ne (Îngilîzî di nav şaxa **Germanîk**, Kurdî jî di nav şaxa **Farsiya Kevn** de ye). Bihevrebûna di nav heman malbatî, bi tevayî nayê wateya hemû taybetmendiyên zimên bişibin hev. Ev hevparî wekî di serî de jî hatibû behskirin dibe ku di hevokazî, peyv sazî yan jî di hêmanekî zimên de bî (morfolojî, sentaks û hwd).

Wekî ku bi awayekî berawirdkirî tê dîtin, ji bo du demên Îngilîzî ku ji hev cuda ne (Present Continuous û Simple Present Tense) di Kurmancî de, tenê *Dema Niha* tê bikaranîn. Cudahî jî bi karanîna hokerên demê (*niha, aniha, vê demê*) dikare bê dîtin. Ev rewş di Almanî, Erebi, Farisî û di Fransî de jî heman form in. Lê di Îngilîzî de, piştî bikêran û berî lêkeran *lêkera bûnê* tên bikaranîn. Û *lêkera bûnê* li gorî vê tên bikaranîn. Mirov nikare wê li gora daxwaza xwe bi bikêrekê cuda re bi kar bîne.

Ev jî wiha ye:

Bikêr	Lêkera bûnê	Lêker + ing
I	am	learn + ing
He / She / It	is	go+ing
We you they	are	wait+ing

Ji ber ku hevoksaziya Kurmancî di *dema niha* û di *dema fireh* te wekî hev in, forma ku di dema fireh de hatiye dayîn dîsa heman form e.

Bikaranîna dema niha ji bona a) behskirina niha ku em bûyerê dibînin b) çalakî û bûyerên ku di demekê nêz de wê pêk bînin c) gilî û gazinên herdem diqewimin tê bikaranîn.

Mînak

- Em niha gotareke li ser demên Îngilîzî û Kurmancî **didin berhev**.
- Heta seetekê ez karê xwe **dîqedînim**.
- Ew her tim di dersan de bi hevalên xwe re **diaxive**.

Mînakên li ser bikaranîna cudahiya Simple Present Tense û Present Continuous Tenseên Kurmancî

Ez her şev pirtûkan dixwînim (konteksa hevokê Simple Present Tense e)

Ez niha pirtûkê dixwînim. (konteksa hevokê Present Continuous Tense e)

Li gorî çavdêriya me û çavkaniyên ku me (li gorî herêman diguherin) bidestxistinê bikaranîna *Dema Niha* û *Dema Fireh* li herêma Semsûrê bi lêzêdekirina “e”yê ji hev tê veqetandin.

Em kar dikin (dema niha)

Em kar dikine (dema fireh)

Di devoka Behdînanî de dema fireh û dema niha ji hev cuda ne.

Mînak

Hesen kitêbê **dixwînit** (Simple Present Tense)

Hesen **yê**kitêbê **dixwînit** (Present Continuous Tense)

Di mînaka duduyan debikaranîna “yê” yê cudahiya demê diyar dike.

Li herema Semsûrê qertafa “e”yê bi lêkerê ve û li pey wê tê bikaranîn lê ev rewş di devoka Behdînanî de li pey bikêrê tê bikaranîn û serbixwe ye. Li ser vî agahiya ku me angaşt kir devoka Behdînanî di ware hevoksaziyê de dişibe hevoksaziya Îngilîzî.

Rêza hevoksaziya normal ya Kurmancî bi gelemperî kirde (bikêr), birêser û lêker e (Thackston, 2006: 35). Lê gava ku hevok bi lêkerên tevgerê/berbîalîkî¹ (hatin, çûyîn, anîn) re tèn bikaranîn rêza hevokê diguhere.

Ez **naçim** doxtor. Ez derman venaxwim. Derziyê jî naxwazim.

Mirov dikare mînakên jêrîn ku bi van lêkeran ava bûne jî binêhîre:

Ez dihêrim malê	I am going home.
Ez fêrî Almanî dibim.	I learn German.
Ew tê mala xwe.	He is coming his home
Ew çû mala Berîvanê	S/he went to Berivan's house
Hevalên min hatin serdana min.	My friends came to visit me.

Di vê rewşê de, rêza hevoksaziyê di her du zimanan de wekî hev in. Divê mirov bal bikişîne li ser van lêkerên ku tevgerê nîşan didin, û bandora guhertina wan jî ji bîr neke. Hevoksazî di Îngilîzî û di Kurmancî de wekhev in.

4. 3. Present Perfect û Dema Boriya Dûdar

<i>Present Perfect</i>	<i>Dema Boriya Dûdar</i>
I have read the book	Min pirtûk xwendîye
You have read the book	Te pirtûk xwendîye
S/he has read the book	Wi/êpirtûk xwendîye
We have read the book	Mepirtûk xwendîne
You have read the book	We pirtûk xwendîne
They have read the book	Wan pirtûk xwendîne

Îngilîzî

have/has + L3

Kurmancî

KDB (Koka dema borî) + ê

Bikaranîna *Dema Boriya Dûdar* wekî bikaranîna *Present Perfecta* Îngilîzî ye. Herwiha di bikaranîna her duyan de jî nediyariya pêkhatina bûyerê heye. Bûyer pêk hatiye lê em nizanin kengî pêk hatiye, di ser re çiqas dem derbas bûye. Bikaranîna *Dema Boriya Dûdar* ji bo îfadekirina rewş û bûyerên a) ji kesên din hatiye bihîstin – b) tiştên ku berî niha di demekê nediyar de pêk hatine c) bûyerên ku berê axaftinê destpêkirine û heya niha didomin d) behskirina jiyana kesekî e) di bûyerên ku qewimî ye û hêj bandore wê dewam dike û f) vegotina çirokên gelêrî de tê bikaranîn

1 Îngilîziya vê termê “verbs of motion” e.

Mînak

- a) Rojnameya New York Timesa Amerîkî derbarê nakokiya navbera Herêma Kurdistanê û Bexdayê de, raportek **belavkirî ye** û tê de dibêje ku tirsra Bexdayê ji wê yekê heye ku, qazenca petrolê bibe destpêka serxwebûna Kurdistanê û veqetandina wê ji Iraqê².
- b) Wî mala xwe **firotiye**.
- c) Heta niha min qet **neditiye** ku ciwanan înternetê ji bona hînbûna zimên bi kar anîne.
- d) Cegerxwîn li gundê Hesarê **hatiye** dinyayê
- e) Mînaka çîrokên gelêrî³
- f) Min şiv xwariye (yanî ez ne birçî me)

Hebû tune bû. Rojek ji rojan gur, rovi û kêvroşk bûn heval û ji xwe re li çiyayan **geriyan**. Ji nişke ve berf **bariye** û **venegeriyane** ketine şikeftêkê. Berf pir **bariye** û ew birçî ketine lê tişteki xwarinê li derdora wan **tunebuye**. Piştê ji hev re **nihêrîne** û **gotine**:

“Em navê xwe bêjin, navê kî nexweşik be, em wî bixwin...”

Gur destpê **kiriye**:

Di çîrokên gelêrî de, îfadeya “rojek ji rojan” kurala “b”yê yanî nediyariyê dide. Lêkerên **kiriye - tunebûye - bariye - nihêrîne - gotine - geriyan** bi awayekî vekirî bikaranîna lêkeran di çîrokên gelêrî de pêşkêşî dikin.

Mînakên “d” û “e” yê di Îngilîzî de ji Kurmancî cuda ne. Gava ku Îngilîz behsa jiyana kesekî dikin ji ber ku rojbûn û serkeftinên jiyana wî/ê diyar in dema *Simple Past Tense* rasterast bi kar tînin. Lê dema ku ev behskirin wekî çîrokeki behsa bûyerên jiyana wî/e bike jî dema *Simple Present Tense* tê bikaranîn. Mînaka “e”yê yanî çîrok jî di Îngilîzî de bi gelemperî bi dema *Simple Present Tense* tê îfadekirin. Mînaka “d” yê wê di Îngilîzî de wekî “*Cegerxwîn was born in the village of Hesar*” bê wergerandin û lêkerên mînaka “e” yê jî wekî “stroll”, “it rains”, “don’t return”, “it snows” doesn’t exist” and “look and say” bê bikaranîn. Di hin çîrokên Îngilîzî de, dema ku tê hîlbijartin her çiqas “*Simple Present Tense*”a Îngilîzî jî be, carinan di dema “*Simple Past*”ê de jî tê bikaranîn

Fossum di xebata xwe de ji bo bikaranîna preterîte dibêje çalakiyek ku di demeke diyar an jî demek nezi axaftinê de pêk tê dibe **preterît** (=dema borî basit) (Fossum, 1919: 86). Di Îngilîzî de ev her dû dem wekî *Simple Past Tense* û *Present Perfect Tense* tên binavkirin. Bikaranîna wan jî bi awayekî diyarker tê dîtin.

2 <http://nucexane.com/new-york-times-bexda-ditirse-petrol-bibe-sedema-serxwebuna-kurdistane.html> 07.12.2015 saet 10.49

3 <http://bianet.org/bianet/kultur/153643-gur-rovi-u-kevrosk> 07.12.2015 - seet 01.44 .

Lêkerên “*sekinîn*” û “*rûniştin*” herdem wekî *Dema Boriya Dûdar* tèn bikaranîn. Ev îstisnayeke gramerê ye. Hemû lêker bi vî şeklî nayên bikaranîn.

Mînak:

Ew çi dike?

Ew rûniştiye. Ew rûdinê. Wek formên gramerê rast e, lê bikaranîn çewt e.

Ew li wir sekinîye. Ew di sekine

4. 4. Present Perfect Continuous û Dema Niha

<i>Present Perfect Continuous</i>	<i>Dema Niha</i>
I have been reading the book for four hours	Çar seete ez pirtûkê dixwînim
You have been reading the book for four hours	Çar seete tu pirtûkê dixwîni
S/he has been reading the book for four hours	Çar seete ew pirtûkê dixwîne
We have been reading the book for four hours	Çar seete em pirtûkê dixwînin
You have been reading the book for four hours	Çar seete eûn pirtûkê dixwînin
They have been reading the book for four hours	Çar seete ew pirtûkê dixwînin

Îngilîzî

Have/has been + Ling

Kurmancî

di + KDN (Koka Dema Niha) + Qertafa kesane

Cudahiyeye zehf balkêş di navbera bikaranîna *Present Perfect Continuous* û hemberê wê de ye. Di Kurmancî de *Dema Niha* bi zêdekirina hokera demê heman wateyê dide. Lê ne xwediyê formeke cuda ye. Herwiha heman wateya ku em bixwazîn bibêjin “berî demekê dest pê kiriye û hêj jî yan jî heta dema axaftinê didome”dide.

Bikaranîna “*Present Perfect Tense*”û “*Present Perfect Continuous Tense*”êdi Îngilîzî de ji sedî sed ne wekî hev bin jî hema hema nêzî hev in. Lê ev rewş di Kurmancî de ne bi vî şeklî ye. Bikaranîna her dû deman hem wekî form hem jî bi wate ji hev cihê nê.

I **have had** breakfast

Present perfect tense

- Min taştê **xwariye**

Dema Boriya Dûdar

I **have been having** breakfast for 10 minutes - Ev deh deqqe ne, ez taştê **dixwim**.

Present perfect continuous

Dema niha

Di mînakê de te dîtî ku mînakên Îngilîzî di her dû deman di hev girtinekê de ne. Lê di Kurmancî de dû demên cuda bi navê *Dema Boriya Dûdar* û *Dema Niha* tê bikaranîn.

4. 5. Past Tense û Dema Boriya Têdeyî

<i>Past Tense</i>	<i>Dema Boriya Têdeyî</i>
I read the book	Min pirtûk xwend
You read the book	Tepirtûk xwend
S/he read the book	Wi/êpirtûk xwend
We read the book	Me pirtûk xwend
You read the book	We pirtûk xwend
They read the book	Wan pirtûk xwend

Îngilîzî

L2

Kurmancî

KDB

Gelek zimanzan ji bona *Dema Borî / Simple Past Tense*ê peyva (têgeha) preterite bi kar tînin. Celadet Alî Bedirxan û Roger Lescot jî di pirtûka xwe ya bi nave “Rêzimana Kurmancî” de vê demê bi navê *preterit* bi nav dikin (Bedirxan û Lescot, 2012: 136). Ev peyv ji Latinî ji peyva *praeterit*ê tê⁴. Preteritê wateya girêdayê berê (bûn)ê. Bi gelemperî di zimanê Îngilîzî, Almanî, Romanî, Fransî, Portekîzî, Spanyolî û Îtalyanî ne de ev peyv di zimannasiyê de berbelav e⁵.

Bikaranîna *Simple Past Tense* û *Dema Boriya Têdeyî* a) bûyerên ku di demekê diyar de qediyane b) çalakî û bûyerên ku di rêzekê de qewimîne c) bûyerên ku berê demekê domiyaye û qediyaye îfade dikin.

Mînak

- Maurizio Garzoni pirtûka xwe *Lingua Kurda* di sala 1787an de qedand. Erebe Şemo di sala 1969an de romana *Jiyana Bextewar* nivîsand.
- Duh (do) seet di 5an de min karê xwe **qedand**, ez **çûm** ba hevalên xwe û me 3 seeten xweş **derbas kir**.
- Ew heft sal di hepsê de ma. Wê çar sal li Krakowê xwend.

Herwiha ev her du bikaranînên Îngilîzî di Kurmancî de bi *Dema Boriya Domdar* tînin îfadekirin. Ev jî cudahiyeke balkêş e.

- Elimandinên berê – He played violin at school- They never lied to their parents.
- Rastiyên ku berê hebûn – She was a shy person

Cudahiyeke ku di Kurmancî de heye û di Îngilîzî de tune ye bikaranînek ku wekî Present Perfecta Îngilîzî û *Dema Boriya Dûdara* Kurmancî ye.

4 <https://en.wikipedia.org/wiki/Preterism>. 07.12.2015 saet 08.26.

5 <https://en.wikipedia.org/wiki/Preterite#French>

Min tirba Feqiyê Teyran li Miksê ziyaret kiriye (Yıldırım, 2012: 116).

Her çiqas dema ziyaretkirinê ji aliyê *bikêrê* ve diyar ji be, *DB Dûdar* tê bikaranîn. Dibe ku *Bikêr bêje baş nayê bîra min ev ziyaret kengî pêk hatiye*, lê însan ji dêvla “*min ziyaret kir*” betir dibêjin “*min ziyaret kiriye*” û wateya *Dema boriya Têdeyî* dide.

Tackston dibêje ku ji ber ku “*Dema Boriya Têdeyî*” ya Kurmancî hem bûyerên pêk hatine û hem ji yên ku di boriyê de mane carinan wekî *Dema Boriya Dûdar* ya Îngilîzî (*Present Perfect Tense*) bi nav dike. Di bikaranîna çapemenî û reklamên ku di serenavan û sernavên çîrokan de tên bikaranîn, di Îngilîzî de bi bikaranîna *Dema Fireha* Îngilîzî (*Simple Present Tense*) tê îfadekirin (Thackston, 2006: 46 - 47).

Kaset û cd derket li hemû muzîk marketan	The cassette and CD have come to (are available in) all music stores.
Konferansa Tevgera Jinên Azad bi dawî bû	The conference of the Liberated Women’s Movement has ended .
Li başûrê Kurdistanê di 10 salên dawî de 2733 kes mirin , 4913 kes jî birîndar bûn .	2733 people have died and 4913 people have been wounded over the last ten years in the south of Kurdistan

Bikaranîna cudahiya deman bi awayê jêrîn in:

Dema Boriya Têdeyî (Kurmancî): **derket -bû -bûn -mirin**

Present Perfect Tense (Îngilîzî): **have come - has ended- have been wounded - have died**

Wateyekî din ku dema boriya têdeyî dide bikaranîna pêkanîna xûy, tevger u tebietên (elimandinên) berê ne. Di Îngilîzî de, ev bi qaliba “used to” yan ji bi “would”ê tê îfade kirin.

Mînak:

Di navbêra suhurandinê û çîrok û henekan de, fêkî, çayê û şêranî danîn bi hev re dixwarin û vedixwarin (Salihe Omeri- ji ware)⁶.

Gundiyan barê xwe datanî eş û kerê xwe dibirin, li xanê girêdidan. Nanekî firnê û sed gram helaw bi hev re dixwarin (Hesen Kaya, ji Ashe Xezebo)⁷

Cudahiyêhiyek heri mezin di nav demên Îngilîzî û Kurmancî de hebûn û bikaranîna ergatîvîteyê ye. Di Îngilîzî de ergatîvîtiya Dema borî tune ye. Herwiha di Kurmancî de ergatîvîte di demên borî de pêk tê û heye. Cînavkên xwerû ku di demên niha û bê de tên bikaranîn (ez, tu, ew, em, hûn, ew) di *Dema Borî* de nayên bikaranîn, li dêvla wan cînavkên tewandî (min, te, wî/ê, me, we, wan) tên bikaranîn. Ev guhertin di Îngilîzî de tune ye. Lêker li gorî bireserê tê kişandin û divê lêker gerguhêz be (xwarin, xwendin, dîtin, şandin...hwd.)

6 http://www.dengekurdistan.nu/arsivabere/dk-yazilar/salihe_omeri_ware.htm

7 <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/ashe-xezebo.html>

Mînak

Min

pirtûk← *xwend/in.*

Te

hek← *xwar /in.*

Wênesazan

wêne← *çêkir/in (Taş, 2013: 65)*

Lê ev rewşa ergatîvîteyê, di lêkerên negerguhêz de û bi cînavkên xwerû (nomînatîv) re nayê dîtin. Eger lêker negerguhêz be, wê gave bi cînavkên xwerû re tîn kişandin.

Lêkera ketinê wekî mînak li jêr hatiye dayîn:

Simple Past Tense	Dema Boriya Têdeyî
I fell	Ez ketim
you fell	Tu ketî
S/he fell	Ew ket
we fell	Em ketin
You fell	Hûn ketin
They fell	Ew ketin

4. 6. Past Continuous û Dema Boriya Domdar

Past Continuous	Dema Boriya Domdar
I was reading the book	Min pirtûk dixwend
You were reading the book	Tepirtûk dixwend
S/he was reading the book	Wî/êpirtûk dixwend
We were reading the book	Mepirtûk dixwendin
You were reading the book	Wepirtûk dixwendin
They were reading the book	Wanpirtûk dixwendin

Îngilîzî

was/were + L ing
kesane)

Kurmancî

di + kdb (koka dema borî) + qk (qertafa

“*Dema Borîya Domdar*” di hin pirtûkan de bi nave “*Çirokiya Dema Niha*”yan “*jî Dema Boriya Berdest*” jî tê binavkirin. Wekî ji navê jî tê fehmkirin, bûyer di demekê berê ku hatiye nişandan de dest pê kiriye û hê jî didome, loma peyva domdariyê hatiye bikaranîn. Di Îngilîzîde jî peyva *continuousê* heman wateyê dide.

Behrooz Shojai jî di dokumanên xwe yên dersê de nave “imperfect îndîkatîv” bi kar tîne (Shojai, 2014: 1):

Împerfekt bûyer, rewş yan kirdarekê derdibirre ku di kêliyêkê de dawî pê nehatiye û ji lewre aspekta wê împerfektîv (nekamil) e. Împerfekt bi vî awayî dihête dariştin.

Cudahiyêhiyek *Dema Boriya Domdar* li gel demên Kurmancî, bikaranîna hevoka demê bi hevokek bîngêhîn re ye. Ti car tenê nayê bikaranîn, her tim bi hevokekî rê ye.

Mînak

Gava ku te qal dikir min pirtûk dixwend.

Doh seet çaran da min pirtûk dixwend.

Bikaranîna *Dema Boriya Domdar* û *Past Continuous Tense* a) rasthatina pêkhatin û domandina du bûyerên cuda b) rasthatina li gorî seetek diyar c) du bûyerên ku bi hev re pêk tên d) gelek bûyerên li çiyekî pêk tên.

Mînak

- a) Gava ku ew li min geriya, min dersa xwe **dixwend**.
- b) Duh seet di 6an de, min dersa xwe **dixwend**.
- c) Dema ku wî behsa rewşa xwe **dikir**, te li wî guhdarî **dikir**?
- d) Duh wextê ku ez ketim salonê, hin xwendekar li ser piyan **bûn**, hinek li ser maseyên xwe dersên xwe **dixwendin**, yên din jî li paşiya salonê **diaxivîn**.

Ev bikaranîn di her du zimanan de wekî hev in, cudahiyekek balkêş ev e ku dem di Kurmancî de wekî elimandinên berê tê îfadekirin. Mirov dikare di Îngilîzî de qaliba “used to” (bnr. Beş 4.5) bikar bîne (Rizgar, 1993: 127). Lê ev her dû bikaranîn li hev nayê. Wateyên her duyan wekî hev in, lê wek form ne wekî hev in.

4.6. Past Perfect û Dema Boriya Çîrokî

<i>Past Perfect</i>	<i>Dema Boriya Çîrokî</i>
I had read the book	Min pirtûk xwendibû
You had read the book	Tepirtûk xwendibû
S/he had read the book	Wî/êpirtûk xwendibû
We had read the book	Me pirtûk xwendibû
You had read the book	We pirtûk xwendibû
They had read the book	Wan pirtûk xwendibû

Îngilîzî

had + L3

Kurmancî

kdb + I+bûn

Ev dem bi navê *Dema Boriya Dûr* an jî *Çîrokîya Dema Boriya (Ne)diyar* jî tê gotin. Îranîstên ku bi zimanzanên Kurdan re dixebitin peyva *pluperfectê* ji bona Past Perfect û Dema Boriya Çîrokî bi kar tînin (Yanon, 2009, 259). Behrooz Shojai jî di têza xweya lîsansa bilind de jî bo Past Perfectê wekî zimannasên Îranîst peyva *pluperfectê* bi kar tîne (Shojai, 2001: 29). Celadet Bedirxan û Roger Lescot jî heman peyvê di pirtûka xwe de bi kar tînin. Peyva *pluperfectê* jî ji latîni tê, û tê wateya

“*plus quam perfectum*”, yanî wateya wê jî “ji mukemmelê wêdetir” e. Mirov dikare bibêje ku gava du bûyerên berê qewimîne tên berhevdan, bûyera ewil pluperfect e, ya dinê (duduyan) jî *Dema Boriya Têdeyî* ye.

Bikaranîna *Past Perfect Tense* û *Dema Boriya Çîrokî* zehf nêzî hev in. Bikaranîn

a) behskirina du bûyerên ku di demek borî de li pey hev an jî yek berî bûyereka din pêk hatiye b) behskirina du bûyerên ku di demek borî de pêk hatine ku bûyerek demekê domiye û qediya ye c) bûyerên ku em ji wan haydar in, lê nizanin çawa pêk hatine d) bûyerek ku bandora vegotinê li ser niha ye.

Mînak

- Heta demek pir dirêj pîrsa dê û bavên xwe jî **nekiribû** – Heya ku ez çûm gundê wan, havalê min ê zaningehê ji wir **bar kiribû**.
- Gava ku me bi erebeyê qeza kir, çar salên erebeyaya me **bibû**.
- Gelo her du evîndaran çawan hev nas **kiribûn**? (Yıldırım, 2012: 113)
- Mirov dibêje qey tu ji bo tiştêkî hati vir?
Ez ji bo ku hinek dirav ji te bi deyn bixwazim **hatibûm**.

4.6. Past Perfect Continuous û Dema Boriya Domdar

<i>Past Perfect Continuous</i>	<i>Dema Boriya Domdar</i>
I had been reading the book	Mîn pirtûk dixwend
You had been reading the book	Te pirtûk dixwend
S/he had been reading the book	Wî/ê pirtûk dixwend
We had been reading the book	Me pirtûk dixwend
You had been reading the book	We pirtûk dixwend
They had been reading the book	Wan pirtûk dixwend

Îngilîzî

had + been + Ving

Kurmancî

di + kdb

Bi heman awayî bikaranîna *Past Perfect Continuous* di Kurmancî de di dema me de tune ye. Lê mirov dikare *Dema Boriya Domdar* bi lêzêdekirina hokerên demê (bi hev re) bi kar bîne, le li gorî fikir û çavdêriya me mirov nikare bibêje ev teqez wekî Îngilîzî ye.

Mînak:

Berî ku tu werî tam du seet e min pirtûk **dixwend**.

Gava em gihastin Amedê, însanên ku mala wan di bin lehiyê de mabûn bi çend rojan li malên din **diman**.

Di hin pirtûkan de wek hevsengê *Past Perfect Continuousê Dema Boriya Domdar ya Nediya* bi forma “*di-lêker-iyê*” tê dayîn. Herwiha di pirtûkên din de, bi taybetî di pirtûka Bedîrxanî de heye, lê ev form zêde nayê dîtin û dibe ku zehf kêmtê / dihat bikaranîn. Ji ber ku di pirtûkên din de hatiye nîşandan, li vir jî hem wek form û hem jî wek agahiyên ku hene hatine pêşkeşkirin.

1.1. Past Perfect Continuous	Dema Boriya Domdar Ya Nediya
I had been reading the book	Min pirtûk dixwendiyê
You had been reading the book	Te pirtûk dixwendiyê
S/he had been reading the book	Wî/ê pirtûk dixwendiyê
We had been reading the book	Me pirtûk dixwendiyê / dixwendine
You had been reading the book	We pirtûk dixwendiyê / dixwendine
They had been reading the book	Wan pirtûk dixwendiyê / dixwendine

Celadet jî ev dem bi kar tîne û di destpêkirina hevokê de dibêje ev dem hema hema qet nayê bi kar anîn lê di periyodek demê de ji bona lêkerek li ber qedandinê îfade bike tê bikaranîn û mînakê jêr dide (Bedîrxan û Lescot, 2012: 138):

Ez diketime

Tu diketiyî

Ew diketiyê

Em diketine

Hon diketine

Ew diketine

Kadri Yıldırım (2012: 125-126) jî di pirtûka xwe de, behsa vê demê bi nave “Dema boriya domdar ya nediya” dike, Forma hevokê heman forme:

Bikêr + dî + koka dema borî + cînav + qertaf

Ez **diçûme**

Tu **diçû(yî)ye**

Ew **diçûye**

Em **diçûne**

Hûn **diçûne**

Ew **diçûne**

Ji bona bikaranîna vê jî Yıldırım ji Mem û Zînê mînakê dide:

Zînê ku dikir ji derdê efxan

Dengê sityê **dîbûye** derman

Gava we ku Mem bi dil dinalî
 Tacdîn **dîbûyê** hekîm alî

Mînakên înternetê ji bo nîşandayîna bikaranîna wê:

- 1) Ew hîkayeyeka kevîna, li Efxanîstanê, di dema Siltan Huseyîn Bayqarayî (~1400'an), siltanekî Tîmûriyan, de qewimiyayî ye. Li medreseyeka nêzîka Heratê, li nêzîka ziyareteka li wê derê, şagirtekî bi navê Mela Memedcan hebûye û wî li wê medereseyê serf û nehîw **dixwendiyê**⁸.
- 2) Di malpera kişandina lêkeran de bi navê Imparfait narratif derdikeve⁹.

min/tu/wî/wê/me/ we/ wan ew/xwe dixwendiyê	min/ tu/wî/wê/me/ we/ wan ew/ xwe nedixwendiyê
--	--

- 3) Îcar kesên ku meletî dikin û ders bidin feqîyan, dibin du nivş: 1) Meleyên Heft ilmî tê gotin ku di Medreseya Kurdî de heft şaxên zanistiyê xwendiyê. 2) Meleyên Duwazdeh ilmî tê gotin ku di Medreseya Kurdî de duwazdeh şaxên zanistiyê **dixwendiyê**¹⁰.

Aydoğan ji bo vê bikaranînê di pirtûka xwe de dibêje li herema Mereş, Entab û Meletiyê hê jî tê bikaranîn (Aydoğan,2013: 63), lê bawerîya me ew e ku bi tevahî wê ji holê rabe, ji ber ku di axaftin û ragihandina peyama ku mirov dixwaze bi de hember de armanc, di hemû zîmanan de, ev e ku mirov bi awayekî demkinî û hêsantir xwe îfade bike.

Demên Bê

Bikaranîna du demên Îngilîzî di Kurmancî de bi demekê tê îfadekirin, û wate di hevokê û di konteksê de zelal e. Dema *Future Tense* di Îngilîzî de di demeke dahatuyê de û demeke dîyarkirî de wê pêk bê le dema *Future Continuous* jî di periyodek nîşankirî de we bidome. Ev cihêtiya demeke dîyar û domandin di Kurmancî de wekî hev e.

4.8. Future tense û Dema bê

I will read the book / I am going to read the book

Ez ê pîrtûkê bixwînim

You will read the book / You are going to read the book

Tu yê pîrtûkê bixwîni

8 <http://fethironi.blogspot.com.tr/2015/03/mele-memedcan-u-ciroka.html> 01.12.2015 seet 15.17

9 https://fr.wiktionary.org/wiki/Annexe:Conjugaison_en_kurde/xwendin 01.12.2015 seet 15.21

10 <http://www.sivildusunce.com/yazilar/425-medreseya-kurdi-u-rola-we-di-wejeya-kurdi-de-2.html#.Vl2fNdIrKM901.12.2015> seet 15.24

S/he will read the book / S/he is going to read the book

Ew ê pirtûkê bixwîne

We will read the book / We are going to read the book

Em ê pirtûkê bixwînin

You will read the book / You are going to read the book

Hûn ê pirtûkê bixwînin

They will read the book / They are going to read the book

Ew ê pirtûkê bixwînin

Îngilîzî

will + L1

be going to + L1

Kurmancî

dê / ê + bi +kdn + qk (im)

Bikaranîna *Future Tense* û *Dema Bê* wiha ye: a) demekê dahatuyê piştî dema axaftinê b) bûyerên dahatuyê ku ji bo wan biryar hatine girtin c) bi gihanekên dema fireh û dema bê hatine bikaranîn d) texmînkirin e) sozdayîn.

Mînak

a) Ez ê pirtûkek baş binivîsim.

Ez ê alikariya wî/ê nekim.

b) Di heftê avrêlê de em ê têkevin ezmûna zimên.

c) Gava ez bigihîjim/giham Wanê, ez ê li te bigerim.

Eger ez aciz bibim, ez ê herim şanoyê yan jî sûtê.

d) Ez bawer im, wê ev film xelatek baş bigire.

Ez dibêjim wê Ehmedê Baqustanî bibe nivîskarekî baş.

e) Soza Xwedê ez ê rewşa te ji kesekî re nebêjim.

Ger ez bibim serokwezîr, ez ê heqê baca her tiştî bi nêvî nêvî bikim.

Di Îngilîzî de du cure dema bê hene. Yek “*Will Future*”ya din jî “*Be Going to Future*” e. Cudahiya wan jî yek di dema axaftinê de li gori daxwaz û xwestinê ye. Ya din jî li gori plankirinê ye. Gelemperî dema Îngilîz diaxivin li gori qeîde û qûralan diaxivin. Ev cudahî bi vî rengî di Kurmancî de tune ye. Di Kurmancî de mirov dikare “ê/ bê/dê/ wê” bi kar bîne lê ev di bikaranîna wateyê de tu cudahî dernaxe hole.

Di Kurmancî de demek bi navê *Dema Bêya Nêzik* heye û bi bikaranîna peyva “dikim” li pêşya lêkerê tê bikaranîn. Di Tirkî de wekî *Yakın Gelecek Zaman* û di Ingilîzî de wekî *Immediate Future* (Barnas, 1993: 5) tê binavkirin. Di Îngilîzî de, peyva “be about to” heman wateyê dide.

Mînak

Ez dikim herim.

(I am about to go)

Tu dikî herî.

(You are about to go)

Ew dike xaniyeke nû bikêre.

(s/he is about to buy a new house)

1.9. Future Continuous tense	
I will be reading the book / I am going to be reading the book	Ez ê pirtûkê bixwînim
You will be reading the book / You are going to be reading the book	Tu yê pirtûkê bixwînî
S/he will be reading the book / S/he is going to be reading the book	Ew ê pirtûkê bixwîne
We will be reading the book/ We are going to be reading the book	Em ê pirtûkê bixwînin
You will be reading the book / You are going to be reading the book	Hûn ê pirtûkê bixwînin
They will be reading the book/ They are going to be reading the book	Ew ê pirtûkê bixwînin

Îngilîzî

Will + be + Ving

Kurmancî

dê / ê + bi +KDN + QK (im)

Di bikaranîna *Future Continuous Tense* de armanc, wekî li jor jî dixuyê, îfadekirina bûyerekê ku di dahatuyê de wê pêk bê û di dema domandinê de ji aliyê bûyerekê din ku wê bi ser de bê.

Minak

I will be watching TV when you come: Gava ku tu beyî, ez ê TVê temaşe bikim.

Hevoka Kurmancî bi şeklê *Dema Bêye*. Le di tiştê ku tê gotin ev e: Di bûyerê de berî ku tu werî ez ê dest bi temaşekirina TV yê bikim û gava ku tu beyî, ez ê jî TV yê temaşe bikim. Û ev her dû bûyer wê rastî hev bîn. Karekê ku di dema pêş te bidome we ji aliyê te bê birîn, tu yê rastî bûyerê bê yî.

4.10. Future Perfect Tense	Dema Bêya Nediya
I will /am going to have read the book	Min ê pirtûk xwendibe
You will /are going to have read the book	Te yê pirtûk xwendibî
S/he will/is going to have read have read the book	Wî/êyê pirtûk xwendibe
We will /are going to have have read the book	Meyê pirtûk xwendibin
You will / are going to have have read the book	Weyê pirtûk xwendibin
They will / are going to have have read the book	Wan ê pirtûk xwendibin

Gava ku mirov dibêje “min xwendibe” wateya *Past subjunctive* (xwestekiya borî) dide , “min ê xwendibe” jî wateya *future perfect* dide, hewce ye mirov ji bona tevliheviyan balder be.

Ev bikaranîn ne wek dema *Future Perfect Tense* lê wekî xwestekiya (subjunctive) Kurmancî heye. Tackston di pirtûka xwe de cih dide wan lê bi du lêkeran sînor dike: zanîn û karîn (Thackston, 1996: 60-61).

zanîn

Ezê bizanîbim
Tê bizanîbî
Ewê bizanîbe

emê bizanîbin
hunê bizanîbin
ewê bizanîbe

karîn

ezê bikarîbim
tê bikarîbi
ewê bikarîbe

emê bikarîbin
hunê bikarîbin
ewê bikarîbin

Mînakên Tackston her çiqas ji *Future Perfect* jî bin wateya wan *Simple Future* e.

Mînak

Edî her kes wê bizanîbe ku karê me çiqas bi zehmet e.

Di ware bikaranîna vê demê de Kadri Yıldırım (2012: 150), du xalên girîng dide:

- 1) Ji bona agahdarkirina hinek bûyer û çalakîyên ku dê pêşîya hinek bûyer û çalakiyan pêk bê tê bikaranîn

Mînak:

Heta ku em bigihîjin nexweşxaneyê, nexweş ê derketibe.

Heta ku ez herim gund, Azad ê ji wir çûbe.

- 2) Ji bona bûyerên ku wê peşîya demeke diyarkirî de pêk be tê bikaranîn.

Mînak:

Heta çarşemê, Rustem ê gihastibe malê.

Gelo heta ez herim, nexweş ê ji newxweşxaneyê derneketibe?

Wekî ku tê dîtîn bikaranîna vê demê heye, lê hevok tenê bi kar nayê, teqez bi hevokeke din re tê bikaranîn. Hevoka bingeîn û hevoka binristeyê hene. Hevokên binristeyê bi gîhanekan ve tên girêdan.

Wek form bê nivîsîn jî bikaranîna dema bê hevokê zelaltir dike. Di axaftinê de ev bikaranîn zehf kêr e û hema hema tune ye, lê di salên dawî de ji ber bandora zimanên din bi piranî ji ber bandora werger û referans girtina zimanên din, ev dem di nivîsê de bêtir cî girîye. Ev dem di Îngilîzî û di Tirkî de zehf tê bikaranîn. Û ji ber medya yan jî axaftinên zimanên din jî mirov bê hemd û bê hişmendî dikeve bin bandora zimanên din.

5. ENCAM

Di vê xebatê de, me demên Ingilîzî û Kurmancî bi hevparî û cudahî dan berhev. Di vir de, wekî rêbaz berê me hevokên Ingilîzî û Kurmancî nivîsîn. Me deman di bin

sê kategoriyan de dan berhev: Demên borî, demên niha û demên bê. Di serdawiye de, formên avakirina wan de formul hatin derxistin. Dûre jî me ev hevok hem şîrove kirin hem jî bi rêya berawirdkirin/dijberhevkinê analîz kirin, û em li ser hevparî û cudahiyan wan sekinîn. Hin tişt wekî hev derketin, hin tişt teqez û bi balkêşî jî hev cihê bûn. Li gorî rewşa zimên di hin astan de me asta texmînkirinê jî bi kar anî. **Mirov dikare bibêje demên Îngilîzî ciyê xwe girtine, lê yên Kurmancî hej ne di wê aste de ne, Loma gelek rêzimannûs û zimannasên ku li ser Kurmancî dixebitin cûrbecûr nawan (têgeh) bi kar tînin û li ser hin tiştan jî hêj yekitî tune ye. Niha jî hin zimanzan li ser yekkirina îfade û termên zimannasiyê hin komxebatan dikin.**

Hin encamên ku di berawirdkirinê de bi dest ketine wiha ne;

1. Hevoksaziya Îngilîzî S – V – O lê ya Kurmancî S – O – V ye. Îstîsna di lêkerên tevgerê (lêkerên berbialikî) de ne **(hatin, çûyîn, gihaştin Ez gihaştîm Wanê).**

2. Dem di her du zimanan de jî hene û îfadekirina deman di fonksiyonê de nezi hev in.

3. Lêkerên bûnê di her du zimanan de, di sentaksê de jî hev vediqetin. Di Îngilîzî de lêkera bûnê tê navbera bikêr û pêvek ê, lê di Kurmancî de tê dawîya hevokê. Herwiha lêkera bûnê di Soranî de jî bi heman şêklê Kurmancî tê bikaranîn.

4. Cudahiya bikaranîna demên Îngilîzî di dema niha û fireh de jî hev teqez cuda ne. Di Îngilîzî de du demên cuda hene, lê di Kurmancî de demek heye û bi lêzêdekirina **hokerên demê jî hev vediqetin.**

5. Hebûna **ergatîvîteya Dema Boriya Kurmancî di Dema Boriya Îngilîzî de** tune ye.

6. Bikaranîna **Present Perfect Tense** û **D.B.Dûdar zehf nêzî hev in. D.B.Têdeyî** car caran wateya PPTê jî dide.

7. **Dema Boriya Têdeyî û Dema Boriya Dûdar** di Îngilîzî de jî hev cuda ne, lê di Kurmancî de **carinan wekî hev tên bikaranîn.**

8. **Present Perfect Continuous** di Kurmancî de wekî **Dema Niha** tê bikaranîn. Di hevokê de heman wate heye lê dem cuda ne.

9. Di Îngilîzî de **Dema Boriya Têdeyî** jî bona elimandinên mirov yên wextê berê (used to) tên bikaranîn, ev dem di Kurmancî de wekî **Dema Boriya Domdar** e. Heman wate jî demên ne wekî hev ve tên bidestxistin.

10. **Past Perfect Continuous** Îngilîzî bi **Dema Boriya Domdar** heman fonksiyonê dide.

11. Di demên bê de bikaranîn û îfadekirina Kurmancî jî ya Îngilîzî hêsantir e. (ji ber ku her du dem bi şêklekî din tên bikaranîn). Di Îngilîzî de wek sê demên cihê ne. Di Kurmancî de du dem bi formekê û demek jî wek subjanktîvê tê bikaranîn.

ÇAVKANÎ

- AIKHENVALD Alexandra Y. (2006). *Grammars in Contact: A Cross-Linguistic Perspective*, Weşanên Zaningeha Oxfordê.
- AITCHISON Jean, (1992) *Linguistics*, Weşanên Hodder and Stoughton.
- ARYADOUST Vahid, (2015) *A Contrastive Analysis of Hewrami and Persian Verbs and Tenses*.
- AYDOĞAN İ. S., (2013) *Guman – 1 Zimanê Kurdî*, Weşanxaneyê Lisê, Çapa yekemîn, Enqere.
- BARAN Rizgar (1993), *Kurdish Grammar English-Kurdish Kurdish-English Dictionary* London,
- BARNAS Rojen, (1993) *Kovara Kurmancî*, zivistan, hejmar
- BEDÎRXAN Celadet Elî û Roger Lescot, (2012) *Kürtçe Gramer*, Weşanên Avestayê, çapa 5a
- BÎLBÎL Mîkaîl & BARAN Bahoz (2008) *Rêzimana Kurmancî*, Enstituya Kurdî ya Amedê, Stenbol
- CORDER S. Pit, (1983) *Introducing Applied Linguistics*, Weşanên Penguin Booksê
- FRIES Charles C. (1957) *Teaching and Learning English as a Foreign Language*, (Ann Arbour: Weşanên Zaningeha Michiganê).
- FOSSUM L.O. (1919) *A Practical Kurdish Grammar*, Weşanên Ausburg Publishing Houseê.
- HADUMOD Bussman, (2006) *Routledge Dictionary of Language and linguistics*, Weşanên Routledgeê.
- JOHANSSON Stig (2008) *Contrastive analysis and learner language: A corpus-based approach* Têza Nehatiya Weşandin. Zaningeha Osloşyê,
- JAMES, Carl, (1981) *Contrastive Analysis*. Weşanên Harlowê: Longmanê ji gotara *Contrastive Linguistics and Contrastive Analysis Hypothesis 3*.
- LADO Robert, (1957) *Linguistics across Cultures*, Ann Arbour: Weşanên Zaningeha Michigan
- LEPSCHY Giulio, (1996) History of linguistics, *The Eastern Traditions of Linguistics*, London,
- NASR T.Raja, (1983) *The Essentials of Linguistics Science*, Weşanên Longmanê,
- ROGER Steven Fischer (1999) *Dilin Tarihi*, Weşanên T.İş Bankası Kùltür, Wer. Muhtesim Güvenç.
- SHOJAÎ, Behrooz (2001) *The Verbal System of Gilan Kurdish*, Têza lîsansa bilind – neweşandî- Zaningeha Uppsalayê.
- SHOJAÎ Behrooz, (2014) *Kopula* – notên derza lîsansa bilind.
- SHOJAÎ, Behrooz, (2014) *Demên Borî*–dokumanên derza lîsansa bilind (neweşandî)- Zaningeha Mardîn Artukluyê.
- SOANE E.B. (1919) *Elementary Kurmanji Grammar*, Baghdad Government Press.
- TAN Samî, (2012) *Hevrûkirina Lêkerên Xwerû û Bingehîn ên Kurdî û Farsî*, Kovara Zendê, Payiz.
- TAN Samî, (2010) *Hinek Taybetiyên Lêkerên Kurmancî*, Zend-Havîn.
- TAN Samî, (2011) *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.
- TASK R.L., Peter Stockwell, (2007) *Language and the Linguistics*, Routledge.
- TAŞ Birahîm Xelîl, (2011) *Keşana Lêkeran bi Zaraveya Kurmancî*. Weşanên Lisê.
- TAŞ, Çetin, (09/2013) *Waneyên Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî*, weşanên Diwanê.
- THACKSTON W.M. *Kurmanji Kurdish- A Reference with Selected Readings*,

- YANON Matras, (2009) **Language Contact**, Weşanên Cambridge,
- YARMOHAMMADI, Lotfolah (2002) *A Contrastive Analysis of Persian and English (Grammar, Vocabulary and Phonology)*, Weşanên Zaningehe Payame Noorê.
- YILDIRIM Kadri, (2012) *Temel Alıştırma Ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*, Weşanên Mardin Artuklu Üniversitesi.
- YILDIRIM Kadri, (2014) *Sorani Öğretmeni*, Berdan Matbaacılık.
- YULE George, (1996) *The Study of the Language*, Weşanên Cambridge

MALPERÊN HATINE BIKARANÎN

1. www.researchgate.net/publication/265103825, downloaded 30.11.2015 seet 9.30
2. <http://nucexane.com/new-york-times-bexda-ditirse-petrol-bibe-sedema-serxwebuna-kurdistane.html> 07.12.2015seet 10.49
3. <http://bianet.org/bianet/kultur/153643-gur-rovi-u-kevrosk> 07.12.2015 - seet 01.44 ..
4. <https://en.wikipedia.org/wiki/Preterism>. 07.12.2015seet 08.26.
5. <https://en.wikipedia.org/wiki/Preterite#French>
6. http://www.dengekurdistan.nu/arsivabere/dk-yazilar/salihe_omeri_ware.html
7. <http://www.pen-kurd.org/kurdi/hesen-kaya/ashe-xezebo.html>
8. <http://fethironi.blogspot.com.tr/2015/03/mele-memedcan-u-ciroka.html> 01.12.2015seet 15.17
9. https://fr.wiktionary.org/wiki/Annexe:Conjugaison_en_kurde/xwendin 01.12.2015 seet 15.21
10. <http://www.sivildusunce.com/yazilar/425-medreseya-kurdi-u-rola-we-di-wejeya-kurdi-de-2.html#.Vl2fNdIrKM9> 01.12.2015 seet 15.24

Extended Abstract

Our objective in this paper is to compare and contrast the English and Kurdish-Kurmanji verb tenses. As known very well, comparative and/or contrastive studies date back to different dates varying from culture to culture or from country to another one. The eastern education starting with the studies of Panini, the western approach starting with the Prag school to the extended researches done by Jacek Fisiak papers and studies in Contrastive Studies in Poland are of great influence on the following studies and importance from the historical perspective. However, when it comes to the Kurdish, the tendency about comparative and contrastive studies are rare and have been carried out in the recent decades. We can claim that not knowing the other languages might be the prime reason for not feeling the necessity to focus on it. Moreover, though both languages are in the same language family, the similarities and the differences between them do exist. When a learner initiates learning one of the languages mentioned above, with no doubt, the similarities facilitates the learning, whereas the differences complicate the learning period and the process, in which the pros and cons of knowing another language becomes a provoking question as to the necessity of knowing another language affect the target language.

The paper starts with the definition of the concepts related to the comparative and contrastive studies. It then goes on to discuss the history of the comparative and contrastive studies in English and Kurdish studies in different major and fields such as phonology, morphology, syntac or semantics. But the comparison will be implemented in terms of syntax and the usage of the tenses. First, the common samples will be chosen and be compared. It can be said that as a method *definition*, *comparison*, *evaluation* and *guess* stages will be used. Even though Kurmanji dialect has been used, examples obtained from Sorani and other Kurmanji dialects have also been dealt with to make the similiarity clear. The formulas for forming the verb tenses, the usage of the tenses have also been drawn so that the readers can see the usage of the tense in a clear way. Then the samples for each usage have been presented to emphasize and show it clearly.

Having no former studies of this nature has brought about some problems in terms of methodology, however it gave rise to an original and a free approach to carry out. Our humgle suggestion about comparative and contrastive studies is that it should be done in separate fields and a great deal of corpus and materials should be studied and examined in order to have the scientific and objective results. As he studies mentioned are at the outset of its road, specific and problematic ares also should be focused on like the subjunctive system, conditional clauses, relative clauses, prepositions and etc. Indisputably, the comparative and contrastive studies might be done between the dialects, whereas in languageas from the Indo-European Languages or from the languages families of which the other languages which are in contact with Kurdish namely, Turkish, Arabic belong to.

In the result part of the article, the results obtained through the usage of the tenses, syntax, sentence syntax and the approach to both languages are of utmost significance. According to the results, while there might be some similiarities between two languages in different branches of the same language family, a great difference among the languages of the same branch is not amazement or astonishment.